


Nexweşîya weremê
l'derdorame de
Ev tê çi manê?



Tendûristxana Bremen

Nexweşîya weremê l'derdoramê de Ev tê çi manê?

Ev gowarname (broşür) bang wan kesan dikê kû yêñ j'bo besdarîya lêgeriyê, j'aliyê tendûrîstxanê hatine gazikirin. Pêwîste kû nexweşîya weremê b'fermi werê agahkirin. Gava tendûrîstxane l'ser nexweşîya werema jîr agahdar bibe, hingê despekirina noşfîretî j'bo kesê nexweş pêwîst dibê û j'bo sinorkirina weremê rîwerî giřing dibê. Nav van rîwerîyan de lêgerandina kaniya hingavtinê û pêşigirtina belevbûna weremê cih disîne.

Eger kesik nexweşîya weremê girtibê, anjî gûmanbire vê nexweşiyêbê, anjî yet mîri vê nexweşiyê girtibê, hingê tendûrîstxane pêwîstdare kû, dozegerînên pêwîst bi kar bînê. Kesen kû, l'ser van dozegerîna hatine pêkanîn, j'bo lêgerînan sedema nexweşiyê j'aliye tendûrîstxane tên peşdarkirin. Pêwîste kû ev pêşdarkirina j'bo lêgerîna sedema nexweşîya he werê cih. Lêgerîna kû l'ser sedema nexweşiyê l'tendûrîstxane te kirin, belaşe. Eger pêşname werê dayîn, hingê masrafa rî jî j'aliyê tendûrîstxanê tê dayîn.

Berya kû em j'were diyarbikin kû, çima û b'çi armanoê tendûrîstxane j'bo lêgerînên l'ser vê nexweşiyê gazi we dikê, em dûxwazîn nexweşîya werema, a vegir, b'çend gütina b'we bidîn naskirin.

Werem çiye?

Werem nexweşik a hingavtineyê.

Azirk a werema kezeba sor, kû berê jêre "nexweşîya helandinê" anjî "nexweşîya felişandinê" digûtan, mîkroba weremeyê. Ev mikrop di sala 1882 de jalîyê Robert Koch hat keşfîrin û sedema nexweşîya weremê hat naskirin. Mîkroben weremê dikarin j'mirovan vegirê mirovan. Mîrovek kû nexweşîya werema vekirî lê hêyi, dikarê gava di axîtinêde, koxandinêde, binişkinêde b'nefesa xwe mîkroben weremê vegirê mîrovêñ l'derdora xwe.



Dr. Robert Koch di sala 1882
de mîkrobêñ weremê keşfîr.

Yanê ev nexweşî vegirê, navê wê yê din jî, nexweşîya hingavtinêye. Miroven kû dijwarî ketinê vê nexweşîyê, dikarin miroven derdora xwe jî vegirin, yanê wan jî bêxin vê nexweşîyêde. Hingavtina b'mîkrobêñ weremê herdem nabin sedemên nexweşîyê. L'Almanye tenê 10% j'mirovêñ kû vê mîkrobê distînîn dikevin nexweşîya weremê. 90% di an xwedîyê hêza berparastinêne û j'bo wê jî, laşen wan xwe dijê nexweşik nû a üsa diparôze. Eger hijmara van mîkrobêñ weremê zêdebin, an jî xweparastina laş j'sedemke behêz bê, dikare bibê sedema nexweşîyê. Werema en zêde hejî werema kezeba sore.

Nexweşîya weremêdê pêşî kezeba sorde girêkên hûr ên idapgirtî çêdibin kû, ew jî filimêde têñ dîtin. Eger wê demê noşfîretî newê kirin, dibe kû idapbûn belavbibê. Dawîya wêde dikarê werema kezeba sor a "vekirî" çêbê. Ev tê wê manê kû, mîkrop derdi Kevin derve û j'bo mirovên kû pêywendiyê xwe kesen dinre dîkin, bibê tehlûka vegirê.

Eger nexweşîya weremê b'temamî bañ nebê û mirov bawerbikê kû ev nexweşî derbasbûye, hingê mîkroben weremê, yên kû mane ð'kezebêde hêlinâ xwe çêdikin, yanê werem rastî jî derbasnebûyê. Ev mîkrop dikarin piştî salan jî dîsa jîr û zêdebibin. Ew dikarin bi riya xûnê herin organên laşde û wêderê dîsa bibin sedemê weremê. Hinge ev dikarê werema hestîya, gûrçikan, rûviyan anjî a mejû çebikê. Ev werema j'dervê kezeba sorda çedibê, navê wê ji extrapulmonale = yanê werema j'dervê kezebeyê.


Werem çawa tê naskirin?

Werem piranî despêkêde ne çavkeşa û arandinêñ xisyetî jî nakê. Mesele despêkê dibe kû, koxik, koxka bêdeng, westin, xwêdana şevê, agirê sîvik, bêîştahî, nefesa b'zahmetî û zaflbûn, çêbibê. Ne kû illeh ev nişanêñ he derdi Kevin hollê, lê belê dikarin diyarbibin! J'ber kû ev nişanêñ he ne baş berçavin, girînge kû mirovên nexweşîya vekirî a weremê girtine û derdûra xwe djîn û kardikin anjî berê dijibûn û karkiribûn, xwe tendûrîst jî bibînin, lêgerîna weremê l'ser wan bê kirin.

Kesên pêywendikar kîne?

- Malkêde, anjî malbatkêde hemû kesên b'hewre dijîn, kesen pêywendikarin.
- Kanxanêde mirovên yek cihî kardikin, anjî nizîk hevdû kardikin, mesele xarinxanêde pêywendiyê teng hewre dîkin. Karker pêywendiyên biçok ji êwanên karde hewre dîkin, lê ev pêywendî ne yên berfirehin, tenê demik kûrt de, demê gûhartina mesayıyêde.
- Wek din jî, pêywendiyen mirovan l'demê valede, gava sporê dîkin, anjî l'xanîkêde dijîn.
- Eger yên nexweş mamosta, perwerdekar, anjî hînvan bêñ, hingê pêwîste kû lêgerinêñ l'ser weremê l'dibistanande, malande, westanande, anjî sazîyen zarokande werin kirin.

Wê gavê hemû hînvanêñ derse dîkin û hemû perwerdekar, kesên pêywendikarin.



Xistina hingavê j'bo kesên pêywendikar çiqas mezine?

Dibetîya (ihtimala) hingavê, j'bo kesek pêywendekar van tiştanre girêdayîyê:

- Pêywendiya hertim, yanê a pircara anji pêywendiyêng teng d'malbatêde, anji tenê pêywendiyêng hînik caran b'cirananre
- Zehfbûna derkirina mîkroban j'alîyê kesek nexweş, yanê çiqas mîkrop axaftinêde, kûxandinêde ûwd. dîdê derdora xwe
- Dûmkirina peywendiyyê, yanê j'kengêve kesê nexweşere pêywendî hebû
- Rawesta kesê nexweş ("disiplina koxkê")
- Pejîndbûna kesê pêywendikar, yanê vêketina pêywendiyyê wî demî j'bo hingave çiqasbû
- Derdora jiyanâ kesê pêywendikar, yanê mal û rewla xarîna wî kesî çiqas baş û tendûrist bû

Dorber a lêgerîna l'derdorê, domkirin u navber a hajekirinê, şarten bi tenê re girêdayîne. Gora xortbûna pêywendiyyê navbera çend haftade, anji mehande, en hindik 2 heya 5 caran lêgerînên kontrolê têr kirin. Ev gora rewşa wî kesî tê peyîvandin.

Lêgerînêde çi dibê?

Çêkirina pirava weremê (Tine - Test)

Pirava weremê (Tuberkulintest), piravek li ser çerm tê kirin kû, j'bo bê zanîn, gelo mîkrobên weremê gihişîye wî kesî ane. Tuberkulin, b'lêexistina mûhirkê l'ser çerm tê çêkirin. Eger wî kesî re mîkroben weremê hebin, hingê ev pirave positive. Cihe kû mutîr hatî lexistin, girêkên kû têr dîtin çêdibin. Hingê pêwîste en zû piştî 72 seetan, en derenk ji heftekê piştî piravê ew cih werê xwendin. Pirava positiv nayê wê manê kû, ew kes nexweşîya weremê girtiye.

Pirova positiv tenê tê wê manê kû, jîyana wî kesîde demkê mikroba weremê vegirîye. Dibê kû ev gelik salan pêşde çêbûbê.

Mihra Tine-Test



Mihra Tine-Teste l'bin
çeng te lêxistin



Xwendina reaksiyona mihrô,
en zû 72 seeta,
anji en dereng pişti heftekê



Eger pirova Tuberkuline positiv bê, hingô pêvîste filima
kezeba sor bê kitandin.

Lêgerîna b'filîma sebata singî (Thorax)

Nasîna filîmén kû l'ser nexweşîya weremê têni
kişandin, l'ser vê nexweşîyê û hedardana wêdê hêjî
cihik girîng digrê. Filîma kû l'ser werema kezeba sor
hatû kişandin de gelik caran gûhartin têni dîtin. J'bo
wê yekê jî ev, nasîna nexweşîya kezeba sorda
bingehik girînge.

Legerînê hîngehê (Loburatuar)

Gava filîma kezeba sorda tiştik çavkâş diyarîbe, hînge
pêwîste kû lêgerînê hîngehê din jî werin kirin. Gava
mîkrobên weremê d'belxemêde diyarîbê, ev tê wê
manê kû, ev nexweşîk vekirî a werema kezeba sore.
J'bo wê jî pêwîste noşferâtik (tedawî) b'lez bekirin.

Armanca hemû rîweran (tedbiran) ewe kû, pêşîya
belavbûna nexweşîyê bê girtin. Şartê en balkêş ewe
kû, rojek zû nexweşî bê naskirin. Rîweriya en giring
jî ewe kû, noşfîretik b'lesîr bê kirin.
Werem nexweşîk kû baş tê noşfîrekirin û tendürîstkirin.

Eger pirsên we hebin, j'kerema xwe
telefonê j'mere bikin.

Gesundheitsamt Bremen
Tuberkuloseberatung

Tendürîstxana Bremen • Şêwra weremê

Frau Pöppke	Tel.: 361 - 15127
Herr Kirmse	Tel.: 361 - 59384
Frau Dr. Oestreich	Tel.: 361 - 10011

kurdîsch